
PC KURD KOVARA KOMPUTER Û ÎNTERNETÊ

**Mir Basın-Yayıncılık Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü (Xwedî û Berpirsê Karên Nivîsaran):** Hamdullah YILMAZ
**Gerînendeyê Giştî yê Weşanê (Genel Yayın Yönetmeni):** Tayip Temel
**Yönetim Yeri:** Gevran Cd. 2 Akkoyunlu Sk. İmbat Apt. Kat. 1 No: 3 İçofis / Diyarbakır
**İlan - Reklam Servisi:** 0412 223 99 34 / **Faks:** 223 78 57
**İdare (Kargerî) Tel-Fax:** (0412) 223 75 60 **Weşan (Yayin) Tel:** 0412 - 237 48 90-91 **Fax:** 0412 237 48 89
**ÇAPXANE (Baskı)**: Gün Matbaacılık
**Belavkirin (Genel Dağıtım):** DPP, YAY-SAT **Edîtorê Berpirs:** Rêzan Tovjîn




# PC KURD
Kovara Komputer û înternetê



Sal:1 ● Hejmar: 1 ● Zivistan 2006
Pêveke Azadiya Welat, bê pere ye.

Bi alîkariya Karger û Şaredariya Sûrê
karger — KOMELEYA LÊKOLÎN Û PÊŞXISTINA ÇAND Û ZIMAN

## Dersên PHP'ê
Êdî hûnê bikaribin bi PHP'ê bixebitin

## Dersên HTML'ê
HTML bingeha zimanên bernamekariyê ye

## Sazkirina Malperan
Hûn jî dikarin malpera xwe çêkin

# Bernameyên Komputerê Dibin Kurdî

Her kes ne mehkûmê Microsoft Windowsê ye. Linux Ubuntu bu kurdî derket û textê Microsoftê dihejîne.





## Ensîklopadiya Kurdî
Ew tekane û mezintirîn ensîklopediya kurdî ye. Hûn jî dikarin bi destê xwe wê mezintir bikin û zimanê xwe bixin nav zimanên dinyayê. Ji bo vê yekê zanîneke pir ne lazim e. Hinek daxwaz û hinek hezskirin bes e.

## Koma PcKurd Werdigerîne
Xewnek kirin rastî, rastiyek belav kirin.

## Firefox û OpenOffice
Bernameyên azad yek bi yek tên wergerandin.

## Opera 8.5
Geroka yekemîn e ku li kurdî hate wergerandin.

## Pêşbaziya Nivîsbariyê 2006
Ev pêşbazî bi tenê ji bo bernameyên kurdî ye.



## Abiword Derket
Tu li ber komputerê rûniştî yî û nivîsa xwe dinivîsî. Her ku tu çewt dinivîsî, ew serast dike. Çewtiyên te nîşanî te dide û rastiya wê ji te re dibêje. Ev jî êdî nexwn e.

# Navnîşanên hotmailê tên bidestxistin!

Bernameyeke bi navê Hotmail Brutus hemû navnîşanên hotmailê yên dinyayê bi dest dixin û di wê lîsteyê de li navnîşana e-peyama (e-mail) te digerin. Heta niha gelek navnîşanên e-peyamên hotmailê yên nivîskarên kurd hatine bidestxistin. Vê hefteyê jî nivîskarê kurd Lokman Polat, ku li Swêdê dijî, bi e-peyamekê têkiliyên xwe hişyar kir ku navnîşana wî ya kevin lokmanpolat@hotmail.com ketiye destê hin kesên êrîşker û ew kes çêran ji têkiliyên wî re dikin.

Van rojan bernameyek bi navê Hotmail Brutus ketiye nav destê Hacker'an. Bi taybetî hacker'ên tirk vê bernameyê li dij e-peyamên rojnamevan, nivîskar û kesên navdar ên kurd bi kar tînin. Navnîşana wan a hotmailê bi dest dixin û bi têkiliyên wan re diaxivin, siqêfan dikin û hewl didin ku saloxan bi vî rengî bi dest bixin.




## Navnîşana hotmailê çawa bi dest dixin?

Berî niha bi çend rojan navnîşana rojnamevana kurd Mizgîn Bîngol jî ketibû destê wan kesan û wan gelek çêr ji kesên di MSN a wê de tomarkirî ne re, gotibûn.

## Xetereya wê di çi astê de ye?

Malpera bi navê PC KURD berî niha bi çend rojan, e-peyameke giştî ji bo bikarhênerên kurd birêkiribû û hişyar kiribû ku dê bûyerên bi vî rengî van rojan rû bidin. Lewre hemû şîfreyên hotmailê yên dinyayê, di lîsteyekê de tên bidestxistin. Jixwe ji ber vê yekê navê bernameyê jî Hotmail Brutus e, yanî wekî xayinekî ji hundir hotmailê, navnîşan û şîfreyên wan dide destê kesên bi niyeta xirab.

Lê ew kes her dem xwe eşkere nakin. Malpera PC KURD jî bikarhênerên kurd hişyar kirin ku xetereya vê yekê zêdetir e. Lewre ew kes dikarin nehêlin tu fêm bikî û her roj peyamên te bixwînin, dû re wekî nexwendî nîşan bikin û jê derkevin. Tê her roj bibînî ku hinek peyamên nexwendî hene, lê tu yê tu caran fêm nekî ku peyamên te berî te, ji aliyê hinek kesan ve hatine xwendin.

Malpera bi navê PC KURD pêşniyar dike ku hûn tiştên nepenî û veşartî li ser e-peyamên xwe nenivîsin û bi taybetî şîfreyan li ser e-peyamê ji tu kesî re neşînin. Divê bête zanîn ku, di înternetê de ji %1 jî tiştekî were veşartin nîn e.

## Hacker'an berê xwe guherandin



Li gor lêkolînên vê dawiyê, êrîşkarên sîber êdî taqtîkên xwe guherandin. Êrîşkarên nû, êdî êrîşî qelşên vala yên Pergalên Xebatan nakin, lê êrîşî bernameyên tên bikaranîn dikin.

Heta van demên dawî êrîşên herî pir ên êrîşkarên sîber, li dora guhertoyên Windows û her wiha Pergalên Xebatan diçû û dihat. Lê di van demên dawî de, daneyên ku tên bidestxistin, nîşan didin ku hedefa wan guherî. Hedefên nû, bêhtir li ser sepanan radiweste. Wekî sedema guhertina hedefê jî, herî pir rojanekirina Pergalên Xebatan tê xuyakirin. Hedefa nû Sepan in Çend roj berê Şîrketa Lêkolînan a bi navê SNS Institite daneyên bi vî rengî diyar kir. Li gor daxuyaniya wan, êdî Şîrketên Nîvîsbariyê yên mezin tevdîra xwe distînin û ji bo qelşên ku tên dîtin, di dema xwe de dagirtin û pîneyan diweşînin. Ji ber vê yekê Pergalên Xebatan her ku diçin bêhtir bi ewle dibin û êrîşkar berê xwe didin ser sepanan. Di Lîsteyê de antî-virus jî heye Di lîsteya êrîşkaran de bernameyên pir tên hezkirin û bikaranîn, hene. Di serî de iTunes, RealPlayer û Winamp hene. Di nav hedefên nû de bernameyên ewlekariyê jî hene. F-Secure, TrendMicro, McAfee û Symantec di van demên dawî de ketine teşqeleya ewlekariyê û pispor ji vê yekê bi tasewas in. Li gor daxuyaniya SANS'ê, di çarîka vê salê de, 600 heb qelşên nû yên ewlekariyê hatine dîtin û hîn jî ev qelş nehatine pînekirin.Her wiha 20 ji van qelşan, gelekî girîng in, xetereya wan mezin e.

## Sergoyê Qada Nîgaşî

Wekî tê zanîn çawa ku computer û înternet kete nava jiyana mirovan êdî têgihiştin ku tenê mirin ji destê mirovan reviyaye. Niha wekî ku em dibêjin malper an jî bi navekî din em bibêjin ensîklopediyên qada nîgaşî rasterast bi înternetê re kete nava jiyana me.

Me her kesî dest bi malpereke bi dilê xwe kir. Ji ber hin sedemanaborî,teknîkî,şexsî û hwd.- malperên me hatin girtin. Gelek caran me ax kişandiye xwezî min kopiyên dosyayên malpera xwe li cem xwe bihişta. Hema bila li ber destê min bûya. Me dixwest em xwe bigîhînin sergoyê malpera xwe.



Niha jî malpereke bi navê http://www.archive.org peywira sergoyên malperan dike. Lê wekî me got ev malper jî sergo ye, dibe ku hûn xwe negihînin hin malperan, hin dosyeyan. Lê dîsa jî hûn dixwazin nostaljî bikin ji kerema xwe re vê malperê ziyaret bikin.

## Exploit Çi Ye?

Exploit Çi Ye, Çawa Tê Bikaranîn?

Di pergalên xebitandinê yên kesane de (mînak DOS) tenê bikarhênerek pergalê bi kar tîne û tenê ev bikarhêner dikare dosyayan veke, bixwîne û hwd.

Lê di pergalên xebitandinê yên ku pir kes di heman demê de dikarin bikar bînin de, divê rêveberek hebe. Ev rêveber di Novellê de wekî supervisor, Di Unix û clonên wê de wekî root, di NT'ê de wekî administrator tê binavkirin. Di van pergalên ku pir kes dikarin tê de bixebitin de kesên ku dixwazin desthilatiya xwe xurtir bikin bernameyên bi navê "exploit" nivîsandine. Exploit, ji tunebûna bernameyeke li ser pergalê sûdê werdigirin û desthilatiya bikarhênerê/î xurtir dikin. Exploit wekî local û remot du cure ne. Exploitên local, dema ku bikarhênerên pergalê bin dikarin bên bikaranîn, lê di exploitên remote de ne hewce ye ku tu bikarhênereke/î pergalê bî. Kêmasiyên pergalan û exploitên ji bo bikaranîna van hatine nivîsandin roj bi roj zêde dibin û ji bo her kêmasiyeke pergalê patch tên nivîsandin.




Hûn dikarin ji http://us.mcafee.com/virusInfo/default.asp?id=alphar ê zêdetir agahî bistînin.



# 8 sazkirinên herî baş ji bo BIOSê

Kovara PCKurd
pckurd@pckurd.net

Tu hîleyên nû yên BIOSê bêyî sazkirina serast ên ku ji berê ve tê zanîn, bi kêrî tiştekî nayê. PCKURD.NET alîkariyê dide te ji bo 8 klasîkên BIOSê bên bîra te.

### 1-Hevkariyên ne pêwist betal bike:


Karta Navîn, ango mainboard a te çiqasî nû be, dê hevkariyên têkve jî ewqasî pirr bin. Karta deng, (sound kart) WLAN, karta dîmenê û gelek amûrên têkveyî li karta navendî hatine zêdekirin. Heke hinek ji van ji aliyê te ve nayê bikaranîn, nexwe betalkirina wê dê bike ku komputera te zûtir vebe. Hem dê bike tu hin birrîên girîng bi paş ve bitsînî. Ji hêla integrated Peripherals a li Award BIOS û li AMI-BIOSê jî li hêla Peripheral Setup tu dikarî betalkirinan pêk bînî.

### 2-Taybetiya Floppy (Drive) seek betal bike:

Her dema tu komputera xwe vedikî, têdebûn û nebûna disketê tê çavlêgerandin. Ev jî dibe sedema derengvebûna komputerê. Hem dengekî hilma mirov teng dike jî jê derdikeve. Ji ber vê, ji pêşeka Advanced BIOS-Features a li Award-BIOSê Boot up Floppy seek bike "Disable." Li AMI-BIOS ji bo tu vê yekê çêkî, divê tu ji pêşekan (menu) Advanced Setup Floppy Drive Seek Disabled bişopînî.

### 3- Tu dikarî taybetiya Virus Warning jî betal bikî:

Ev taybetî li hember virusên ku ketine beşa Master boot Record te hişyar dike. Pirr nehatiye dîtin ku vê taybetiyê êrîşeke rastîn a virusan bend kiriye. Her wiha ne taybetiyeke wisa ye ku tu dest ji bernameyeke dij-virus berdî. Tu dikarî vê hişyariya virusên Biosê bi rihetî bigirî. Ji bo kesên xAward-BIOS dixebitînin, li bin pêşeka Advanced BIOS-Features, Vebijarka Virus Warning bike Disable. Di AMI-BIOSê de jî tu dikarî li hêla Virus Protection vê taybetiyê betal bikî.




Mirov dikare mîhengên BIOS'ê biguhere. Em pêşniyar nakin ku kesên jê fam nekin guhertinan bikin. Lewre guhertina mîhengan garantiyê radike.

### 4-Betalkirina Quck Power on Self-Test

Heke pergala te bi tenduristî dixebite, ne pêwist e di her vebûnê de bîr were hejmartin. Ji bo Award-BIOSê li Advanced BIOSê Features ji bo AMI-BIOSê j îli Advanced Setup tu dikarî vê taybetiyê betal bikî, "Enable."

### 5-Taybetiya (Flash) BIOS Protection çalak bike:

Ev taybetî nahêle BIOS were jêbirin, an jî dîsa li ser were nivîsîn. Ji ber vê yekê baş e ku wekî "Enable" bimîne. Bi tenê dema te BIOS rojane kir, vê taybetiyê bigire. Di hinek guhertoyên Award-BIOSê de ev taybetî bi navê Flash Update ye, ji bo tu parastina lênivîsandinê çalak bikî, vê taybetiyê bike "Disable."

### 6-Bikaranîna PS2-Mouse Function Control

Ji bo kesên ku dixwazin birrîneke IRQ têxe valahiyê ev taybetî gelekî cazîb e. Ev sazkirin ku di rewşa Enable de be, BIOS IRQ ya 12an ji bo PS2 mişkê vediqetîne. Ji ber vê rewşa heri baş dê Auto be. Ji ber vê yekê, heke mişkek li pergalê nehate girêdan, birrîna 12an dê ji bikaranînê re vekirî be. Di BIOSê de bi pirranî tu dikarî li bin sernavê PS2 Mouse Power an an jî li bin sernavê PS2 Mouse Support lê rast werî.

### 7-Bikaranîna Onboard IR Function

Di van demên de ku em komputera xwe ya li odeya xwe ji dûrî ve bi dûresazê bi rê dibin, taybetiya infra-red hîn bêhtir balê dikişîne. Heke di pergala te de amûreke ku bi infra-red dixebite tune be, tu dikarî vê taybetî têxî rewşa Disabled. Heke di karta navendî ya te de hevkareke girêdayî infra-red hebe IrDA-Mode an jî Ask IR Mode çalak bimîne dê çêtir be.

### 8-Sazkirinên FSB Spread Spectrum

Ev taybetî ji bo ronîdana elektromanyetîk a ku Frontside Bus (FSB) belav dike dakeve asta herî nizim, leza saetê a FSB dadixe nêvî, an jî bêhtir dadixe. Ji ber vê yekê çêkerên komputeran ji bo Bawernameya Ewlekariyê CE encamên bilindtir distînin. Dema tu leza saeta FSB bilind bikî, ev taybetî stabiliteya pergala te xira dike. Ji lew re vê taybetiyê bike Disabled. Di rewşa xebata asayî de sazkirina di asta nizim de %1 bes e.

## Destpêka dersên HTML'ê

HTML: Hyper Text Mark-up Language

Dema me çend kesan Koma Pc Kurd ava kir, me texmîn nedikir ku rojekê emê werin vê astê. Îro êdî em pirtûkên vî karî dinivîsin û her ji 6 mehan xortekî din dikeve nav me.

Divê mirov HTML'ê baş bizane. Ew zimanê bingehîn ê înternetê ye. Ji bo mirov malpereke baş ava bike gelekî pêdivî ye.

Dema mirov bi riya gerokê dixwaze malperekê veke, mirov bi alîkariya www. navê malperê dinivîse û malperê vedike. Mirov dibîne wa ye wêne, nivîs, xêz û hin tiştên din bi awayekî xweşik, rêzkirî û balkêş derketin.

Mezinbûna nivîsan...

Rengê nivîsan...

Dema mirov ditikîne rûpelekî din vedibe...

Berî mirov bitikîne nivîs reng diguhere...

Berî mirov bitikîne nivîs mezinahiyê diguhere...

Kîjan wêne li ku, çawa disekine...

Dirêjahiya xêzan...

Stûriya xêzan...

Nivîsa stûr, paldayî û binxêzkirî...

Divê tu bizanî ku di vê rûpelê de ev bikêrî hemû bi HTML'ê dihatin pê. Îro gelek zimanên din hene ji bo malpersaziyê. Lê HTML bingeh e û di hemûyan de jî bi awayekî heye.

HTML di nav zimanên bernamekariyê de yê herî hêsan e...

HTML bi tenê rûpelên bêtevger (statik) çêdike...

Zimanên rûpelên bitevger amade dikin jî HTML'ê bi kar tînin...

Tu HTML'ê nizanibî, tu nikarî malperekê çêkî...

Tu hoste yî, HTML amûra te ya herî hêsan e...

HTML zimanê teşedanê ye...

Pir hêsan e, bi kêrî hindik tiştan tê...

Divê tu bizanî ku rûpelên malperê ji dosyan pêk tê. Ew dosiyên HTML'ê ne. Gerok wekî "dosiyên htmlê" gazî wan dike. Jixwe cureyê dosiyên wê jî .html û .htm ne.

Edîtor û bernameyên wekî Front Page nahêlin tu hîn bibî...

Pêşî HTML'ê hîn bibe, dû re bernameyan bi kar bîne...

Tê bi Lênûska Nîşeyê HTML'ê çêtir hîn bibî...

Piştî tu hîn bû, tu jî gotarekê der barê wê de ji me re binivîse ku em jî tiştekî ji te hîn bibin...

Fermo!

Serkeftin Ji te re!

# Ciwanekî Pîranşarê cara yekemîn Wîndowsa XP kire Kurdî

Malpera Peyamnêrê nûçeyek weşand ku gelek balkêş bû. Luqman Bexte ciwanekî bajarê Pîranşara ser bi Kurdistana Îranê, piştî pitir ji salek û heft mehan mandîbûn û karkirinê, karî Wîndowsa XP bi tevahî bîne ser zimanê Kurdî.

Eva ji bo wan kesan ku bi başî zimanê Îngilîzî nizanin, hêsankariyeke baş e. Ji ber ku Luqman dibêje Wîndowsa wî her ji destpêka dabezandin bo ser Kompyuterê, hemû aykonên wê bi zimanê Kurdî ne.

Wî ciwanê Kurd çend kar û pirojeyên din jî li ber dest de hene. Yek ji wan serpêhatî û berhemên stranbêjên Kurd e, nermamêra wê bi awayekê ye ku dema mirov li ser navê stranbêjekê bitikîne, dikare serpêhatiya wî/ê bixwîne û berhemên wî/ê guhdarî bike.

Hêjayî gotinê ye ku kekê Luqman waneya Kompyuterê li çi xwendingehekê û li cem çi fêrkarekê nexwendiye.

Tê gotin ku Wîndowsa Kurdî ya ku birêz Luqman Bexte çêkiriye heyva tê dikeve bazarê û hemû kesek dikare mifahê jê bistîne. Zimanê wîndowsê bi zaravê Soranî hatiye amade kirin.

Desteya Nivîskar ya Agirî pîrozbahiyên germ ji birêz Luqman Bexte, ciwanê xwedî şiyan û karîn yê Kurd dike û jêre hêviya serkeftinên pitir dixwaze.



# Pirsgirêka Klavyeyê



Çend kes û malperan xwestin klavyeya kurdî çêkin. Mixabin ev xebat ne li gor zimanzanî û pisporiyê tên kirin. Ji lew re jî pirsgirêkê çareser nakin.



Klavyeyên bi tîpên erebî êdî tu pêşerojê ji kurdan re naynin. Kurd bi tevahî hêdî hêdî derbasî tîpên latînî dibin. Divê çareya klavyeyê bi latînî çareser bibe.

Klavyeya kurdî jî bû pirsgirêkeke girîng êdî. Bernameyên kurdî derdikevin, Linux Ubuntu di destpêka sala 2006'an de dê di nav kurdan de gelekî belav bibe û pirsgirêka sereke jî klavye ye. Lewre tîpên û, î, ş, ç, ê bi hêsanî nayên nivîsîn, heta li gor klavyeya hin welatan qet nayê nivîsîn.

Di malpera pckurd.net de jî ev mijar bi rojan tê nîqaşkirin. Hêjayî gotinê ye ku mirov bêje, klavyeya kurdî ne karê teknîsyen û komputergerên kurd e. Ew karê Saziya Zimanê Kurdî ye û saziyek bi vî rengî nîn e.

Saziya Zimanê Kurdî, divê rûne û klavyeyek wisa amade bike û bi kurdî mirov bikaribe bi hêsanî binivîse. Mînak, niha li ber herkesî Q Klavye heye. Ev klavye li kurdî nayê. Lewre tîpên wê li gor kurdî nehatiye rêzkirin.

1- Tîpên kurdî nîn in.

2- Tîpên din jî li gor kurdî nehatine rêzkirin.

Zimanzan klavyeyê wiha amade dikin:

1- Em tîpan çawa rêz bikin, ku hevok ji aliyê destekî ve neyê nivîsîn û her tîpek ji aliyê destekî ve were nivîsîn.

2- Em tîpan çawa rêz bikin, ku mirov bikaribin nivîsa xwe bi lez binivîsin.

Q Klavye di kurdî de li van herdu armancên jorîn nayê. Bi Q Klavye destek ji destê din bêhtir dinivîse û diweste, diqerime. Her wiha mirov pê dereng jî dinivîse.

Li Aliyê din, li Tirkiyeyê F Klavye heye. Ev klavye jî bersîvê nade kurdî. Ji Q Klavye gelekî çêtir e, lê pirsgirêkên zimanê kurdî çareser nake. Li ser F Klavye herdu dest bi hev re dixebitin û her tîpek ji aliyê destê din ve tê nivîsîn.

Heke li ser F Klavye pirsgirêka tîpên Ê, Û, Ç, Ş û Î were çareserkirin, dê ev jî çareser bibe. Tew nebe dê ji bo demekê were ceribandin.

Di vî karî de encam bi pêşbaziyan belî dibe. Klavyeya Nefelê, Klavyeya Kurditgroupê û Klavyeya ku bi rastî jî li gor zimanê kurdî ava bibe divê bikevin pêşbaziyê. Kê li ser klavyeya xwe gotara xwe zûtir nivîsî, ew klavye serkeftî ye. Lê divê mirov ji niha ve bêje, Q Klavye di pêşbaziyan de heta niha neketiye pêşiya F Klavye.

## Bazara Vî Karî

Helbet bazara komputergeriya kurdî êdî dê derkeve holê. Li dinyayê gelek bername niha ji xwe re li wergerên belaş digerin. Me bi dehan bername ji wan re wergerand, da ku bazara zimanê kurdî çêbibe. Sibe dê hin şîrketên mezin rabin wergerên taybet ji bo xwe bistînin û hin jî dê bixwazin Klavyeya Kurdî ji fabrîkeyên xwe derxin. Ji bo ku tiştên hatine serê zimanê kurdî neyê serê komputergeriya kurdî jî, divê ev pirsgirêk zûtirîn dem ji aliyê saziyên têkildar ve were çareserkirin. Mixabin, xuya ye ku lêkolîn û xebatên vî rengî têkildarî aboriyê ye û hemû saziyên têkildarî vî karî jî ji tunebûnê nikarin destê xwe bilivînin.



Ev mînak jî ne mînakeke serkeftî ye ji bo klavyeya kurdî.



# Ensîklopediya Azad

*Kovara PcKurd, Wikipedia ku bi felsefeya 'naveroka azad' di demeke kin de bû çavkaniya referansê ya populer dinirxîne.*




Heta îro we bi dehan ensîklopedî dîtiye. Lê we îmzeya xwe dananiye bin wan. ensîklopediyeke ku di her warî de bi agahiyên xwe bibe çavkaniya me nîn e. Ensîklopediyeke wiha hem ji bo xwendekaran, hem ji bo nivîskar û rewşenbîran û hem jî ji bo zanist û lêkolîneran tiştekî pir pêdivî ye. Ensîklopediyeke kurdî… Heke hinek ji te re bêjin "Em dest bi amadekirina ensîklopediyeke wisa dikin, tu jî di nav de cih bigire", tê çi bêjî? Tu bawer dikî ku rojekê derfeteke wiha têkeve destê te û tu îmzeya xwe deynî bin ensîklopediyeke navnetewî? Ne pêwist e ku gotinê dirêj bikin. Niha derfeteke bi vî rengî ji bo her kesê ku bi kurdî dizane, heye. Ev ensîklopedî îro êdî heye jî.

Ev xeyal ji bo kurdan bi riya Wikipedia pêk tê. Berî ku em li ser ensîklopediya kurdî rawestin, emê hinekî li ser dîroka Wikipedia rawestin.

Wikipedia, bi alîkariya bi hezaran kesên ku zimanên cuda dizanin û bi riya înternetê keda xwe digihînin hev, pêk hatiye. Wikipedia îro li dinê ensîklopediyeke ji ensîklopediyên herî mezin e. Van deman, dema mirov di Google de li gotinekê digire, di rêzika yekemîn de rûpela dazanîna wê gotinê ji nav rûpelên Wikipedia derdikeve. Di nav rûpelên Wikipedia de her tişt ewqasî berfireh û bi agahiyên têrtije tên nivîsîn ku gelek caran pêwistî bi lêgerîna di Google de namîne. Tiştek heye ku îro Wikipedia evqasî mezin û berfireh kiriye. Ew jî bingeha wê ya bi navê 'Wiki' ye.


## Wiki çi ye?

Berî mirov dest bi kîtekîtên Wikipedia bike, divê mirov felsefeya wê bizane. Ji bo vê jî divê berî her tiştî mirov bizane bê Wiki çi ye. Ji ber ku bi awayê Wiki malperên kurdî pir nîn in, dibe ku Wiki bi we biyanî bê.

Wiki, sepaneke wisa ye ku hem destûrê dide bikarhêneran ku agahiyan li malperê zêde bike hem jî agahiyên ku hene biguherîne. Wate di malpereke wiki de, her kes dikare rûpelan li gor xwe ji nû ve serast bike, tiştan lê zêde bike. Her wiha hemû guhertinên ku tên kirin tomar dibin û bi wî rengî tên weşan. Her wiha kesekî/ê din jî dikare têkevê û wan rûpelan bi awayekî din biguhere û tomar bike. Yek jî dikare guhertinên ku te kirine hemûyan bi paş de vegerîne û bike wekî berê.

Ev taybetiya Wiki bila çavên we netirsîne. Bê çawa tu dikarî tiştên baş li malpereke wisa zêde bikî, gelek kesên din jî hene ku dikarin bi qasî te agahiyên balkêş û nedîtî lê zêde bike. Dibe ku yek bixwaze agahiyên we bi niyeteke xerab xera bike, lê ev yek ne xem e. Lew re hem kesên bi vî rengî hindik in û kes bi vê armancê zêde nêzîk nabin, hem jî ku tiştekî wisa çêbibe jî rêveberên malperê dikarin bi hêsanî rûpelan bikin wekî berê.

Ev sepan, berhevkirina dokumanan gelekî hêsantir dike û agahî bi lez dikevin ser hev. Di her rûpeleke Wiki de wekî prensîb 'biguhere', 'serast bike', 'edit' an jî bişkoşkeke bi navekî bi vî rengî heye. Dema tu pê li vê bişkoşkê dikî, tu xwe digihînî rûpela çavkaniyê. Zimanekî nîşankirinê yê hêsan ê Wiki heye ku bikaranîna wê hêsan e. Ev ziman di malperê de li gor nivîsbariya ku tê bikaranîn dibe ku biguhere. Heta tu dikarî zimanê HTML'ê an jî edîtoreke dîmenî jî bi kar bînî.



Her kes dikare têkeve malpera Wikipedia û li gor zimanê xwe agahiyan berhev bike. Heta dikare agahiyên nû li malperê bar bike.

Di rûpelên Wiki de bi gelemperî mirov dikare girêdanê bide gotinan jî. Ev riya herî hêsan a mezinkirin û gera di hundir wiki de ye. Em bi mînakekê bêjin: Em bêjin malperek te der barê erdnîgariyê de heye û te di rûpeleke wê navê Wanê dibore. Dema tu girêdanekê didî gotina Wanê, bixweber rûpelek bi navê Wan tê afirandin. Êdî divê tu têkevî wê rûpelê û der barê bajarê Wanê de jî agahiyan binivîsî. Di hundir gotara te de çend gotin hebin ku tu difikirî divê wateya wê were nivîsîn, divê tu girêdanekê bidê. Dema te girêdan da gotinekê û piştî rûpela wê ya nû ya vala vebû, te tiştek tê de nenivîsî, ew gotin bi rengekî belî dibe. Heke te naveroka wê tijî kir, hingê jî bi rengekî din ew gotin belî dibe. Tu ne mecbûrî hemû rûpelên vala dagirî. Lewre dê piştî te gelek kesên din werin û dê yek ji wan bixwaze vê rûpelê binivîse. Zincîra wê bi vî rengî dirêj dibe. Mirov dikare vê yekê bişubîne darekê û guliyên wê.

Di wiki de her nivîskarek ne xwedî nasnameyekê ye û li ben rûpelan navê wan nayê nivîsîn. Di wiki de rûpel hemû di bin beşa xwe de ne. Di wiki'yê de armanc hêsankirina gihaştina agahiyan e. Ne cihê wê ye ku kes şîroveyên xwe der barê tiştan de binivîsin.

## Ensîklopediya Azad

Digel mentiqa wiki ku bingeha Wikipedia ye, divê mirov têgiha 'naveroka azad' bizane ku ew jî bingeha drûşma 'ensîklopediya azad' e. Hemû agahiyên di Wikipedia de, di hundir lîsansa GNU Lîsansa Pelgekirina Azad de ye. Bêyî ku sînorekî telîfî hebe dikare bi azadî were bikaranîn. Ji ber vê taybetiya xwe jî Wikipedia populer bûye.

Îro Wikipedia îngilîzî bi keda bikarhêneran ji 700 hezar rûpelî derbas bûye. Wikipedia tirkî ji 6 hezar rûpelî boriye û Wikipediya kurdî jî li dora 2 hezar rûpelî ye. Mirov di Wikipedia de dikare xwe bigihîne gelek agahiyên der barê çand, erdnîgarî, dîrok, jiyan, zanist, civak û teknolojiyê de. Wikipediya ku bingeha wê Web e, li gor lêkolînekê di înternetê de malpera herî populer a referansê ye.




Wekî tê d îtin gelek cureyên Wiki hene. Di beşa kurdî de jî ev beş bi destê Erdal Ronahî tên birêvebirin.

### Wikipediya Kurdî

Mirov dikare ji navnîşana ku.wikipedia.org xwe bi hêsanî bigihîne beşa kurdî ya Wikipedia'yê. Wikipedia Kurdî bi heman prensîbên Wikipedia be jî, mixabin ku heta îro bi qasî birayên xwe yên din mezin nebûye. Jixwe mezinkirin, zêdekirina agahiyên wê û heta xistina wê ya di nav mezintirîn ensîklopediya dinê de, di destê me de ye. Piştî ku mirov hinekî di Wikipediya Kurdî de geriya, mirov dikare bi hêsanî prensîbên wê fam bike û zanînên xwe lê zêde bike. Ji bo tu destê xwe navêjî vê ensîklopediya navnetewî tu sedem li ber kesî nîn e. Êdî hincet nîn e.



Bi taybetî beşa komputeriyê ji sala borî û vir te tê pêşxistin

### Lêkolîn û Pêşxistin


Em bêjin der barê mijarekê de pêdiviya te bi hin agahiyên ensîklopedîk heye û tu dixwazî ji bo vê di hundir Wikipedia Kurdî de bigerî. Çend riyên cuda hene ji bo tu xwe bigihînî agahiya ku tu lê digerî. Berî her tiştî, di her rûpelê de, li aliyê çepê zeviya lêgerînê heye, ku tu dikarî gotina tu lê digerî di wir de binivîsî û pê li bişkoşkê bikî da ku di hundir Wikipedia Kurdî de tişta tu lê digerî derkeve pêşberî te. Heke li gor gotina tu lê digerî sernivîsa rûpelekê hebe, dê te serast bibe wir. Lê ji bo lêgerînê alternatîfek te ya din jî heye. Tu dikarî li serûpela Wikipedia Kurdî, ji nav alfebayê tîpekê hilbijêrî û li gor gotinên bi wê tîpê dest pê dikin, bigerî. Heke tu li gotinekê nagerî û tu li mijareke gelemperî digerî, nexwe divê tu beşên ensîklopediyê bi kar bînî. Bi vî rengî tu dikarî xwe bi hêsanî bigihînî gotarên ku di bin beşa xwe de bûne rêz. Wekî mînak em li gotina 'Ehmedê Xanî' bigerin. Dê Wikipedia Kurdî me berêveyî rûpela 'Mele Ehmedê Xanî' bike. Di rûpelên wiha dirêj de, pêşî lîsteyeke mijaran heye. Bi vî rengî riyeke hêsan dide te ku tu di hundir gotarê de bi hêsanî bigerî. Di rûpela 'Ehmedê Xanî' de tê wêneyê wî, berhemên wî, felsefeya wî, jiyana wî û dîtinên wî bibînî. Heke te divê tu agahiyan li van tiştan zêde bikî, divê tu bişkoşka 'biguherîne' ya li aliyê rastê yê jêrîn bitikînî. Her wiha tê bibînî ku hinek girêdan di hundir rûpelê de sor in, hinek jî hêşîn in. Gotinên ku bi rengê hêşîn hatine belîkirin, xuya dike ku tu wan bitikînî tê herî rûpela wê gotinê û ew rûpel tijî ye. Lê gotinên ku bi rengê sor hatine belîkirin, xuya dike ku rûpela wê hatiye vekirin lê vala ye û divê hinek binivîsin.

Hin zagonên lêzêdekirina li rûpelên Wikipedia jî hene. Berî her tiştî, heke tu naxwazî agahiyên tu dinivîsî ji aliyê hinekî din ve were guhertin, lêzêdekirin û bikaranîn, nexwe divê tu nenivîsî. Her wiha agahiyên ku tu dinivîsî, an divê ji aliyê te ve hatibin nivîsîn, an jî divê ji çavkaniyeke azad hatibe standin. Berhemên ku mafê wan ê telîfê tên parastin, tu nikarî têxî nav rûpelên Wikipedia, ev qedexe ye. Heke tu tiştekî wiha lê zêde bikî, berpirsiyariya wê bi tevahî di stuyê te de ye. Digel van, agahiyên ku tê binivîsî divê ne şexsî bin, divê li gor pêdiviya ensîklopediyan be, divê şîroveya şexsî nehundirîne û çewtiyên rêzimanî tê de tune bin. An jî heta ji destê te hat divê tu çewtiyên rêzimanî nekî. Heke der barê gotarekê de tu bixwazî şîroveyeke şexsî binivîsî, li ser rûpelê bişkoşka 'nîqaş'ê heye ku divê tu bitikînî û dîtinên xwe binivîsî.

### Wikimedia

Projeya Wikipedia di demeke kin de ewqasî bi ser keft ku, bi navê Wikimedia malperên cuda ên referansê hatin çêkirin. Di wikimedia de wêne û medyayên azad tên weşan. Her kes dikare têkeve vê malperê û wêneyên ku dixwaze di vê çavkaniyê de bi cih bike, bişîne.

# PsPad, bernameyeke edîtorî




PSPad bernameyeke edîtorî ye. Bi alîkariya vê bernameyê, mirov dikare script'an binivîse, an bernameyan saz bike, an jî wergera bernameyekê, an dosiyekê bi hêsanî, di demeke kin de pêk bîne. Her wiha cudahiyên di navbera gelek guhertoyan de jî bi hêsanî tê dîtin.

PSPad bernameyeke bi gelek zimanan hatiye weşan. Lê kurdiya wê tunebû. Ji bo hêsankirina nivîsandina script û bernameyan PSPad gelekî pêwist bû. Niha mirov dikare bi hêsanî ji pspad.com guhertoya (versiyon) dawî belaş daxe û zimanê kurdî hilbijêre.

Ji bo kesên ku dixwazin bernameyan wergerînin kurdî jî gelekî girîng e. Ne ji bo wergerê, lê ji bo rûbirûkirina du guhertoyan gelekî jêhatî ye. Mînak, dema tu guhertoya Abiwordê ya kevin û ya nû bi hev re vekî, heke tîpek bi tenê cudahî di navbera herduyan de hebe, bi rengê kesk xuya dike.




Bi kar bînin, hûnê jê hez bikin.

Ji bo alîkariyê di foruma pckurd.net de binivîsin.







Malpera PcKurd.Net jî malpereke ku bi PHP'ê hatiye amadekirin. Divî warî de ne malpera yekemîn e jî û ne ya tekane ye jî. Lê di warê xwe de xelek xebatên girîng pêk anî û niha tekane navnîşan e.

CGIPERL an jî ASP, ColdFusion, Java (ne Javascript) ! Kod ên PHP'ê, dema me rûpelên HTMLê çêkir, di nav etîketên HTMLê de , di nav veqetandeka xwe ya taybet de tê nivîsîn.

```
?PHP
echo ("Merheba Koma PCKurd!");
?>"
```

Te divê di komputera te ya şexsî de, te divê di înternetê de, dema Pêşkêşkereke Webê dibîne ku mêvanek (bernameya daxwazkar a înternetê, GerokBrowser) dosiyeke ji cureyên ".php", ".php2", ".php3" an jî ".php4" dixwaze, hema ji xwe re dibêje "Aha dîsa ji min re karek derket." Lewre Pêşkêşkerê Webê dosiyeke ji cureyên ".htm" an jî ".html" bi hêsanî di dîska xwe ya bicihkirî de dibîne û bêzehmet ji daxwazkar e dişîne. Lê dema ku ".asp", ".pl", ".cfm" û her wiha ".php" tê xwestin, Pêşkêşkerê Webê vê rûpelê wekî ku heye ji daxwazkar re naşîne. Pêşî gazî şîrovekarê PHP'ê dike û pê dide zanîn ku divê ew vê dosiyê radestî daxwazkar bike. Şîrovekarê PHP'ê (ango di Windowsê de PHP.EXE, an jî di guhertoya çaran de PHP4isapi.dll, di Unix û mînakên wê de dosiya PHP ku dikare were xebitandin), vê dosiya ku radestî wî bûye, pêşî kod ên PHP'ê yên di navbera veqetandeka "" de ne, hildibijêre û pêwistiya wê çi be, wê dike. Ev kod ên ku di navbera van veqetandekan de ne, fermanên karên ku em dixwazin pêk werin e. Sedema ku em bi HTMLê nehatine ser û PHP'ê bi kar tînin jî, tişta ku ev ferman dikin ji aliyê HTMLê ve nikare bête pêkanîn.

Di vir de tiştên ku HTML nikare bike çi ne? Berî her tiştî hinek karên ku divê di Pêşkêşkerê Webê de werin kirin hene. Di serî de em nikarin bi riya etîketên HTMLê dosiyeke danegira di Pêşkêşkerê Webê de vekin û daneyên tê de bixwînin. Em bi riya HTMLê nikarin dosiyên nivîsa xwerû ya di dosiyen dîskên bicihkirî yên Pêşkêşkera Webê de jî nikarin bixwînin.

# Rojanekirina PHP-NUKE

Em bêjin malpereke te heye. Te ew bi Php-Nuke 7.1 ava kiriye. Lê piştî vê guhertoyê, Php-Nuke 7.2, 7.3, 7.4, 7.5 û 7.6 derketiye. Nexwe divê tu guhertoya xwe jî nû bikî.

Di vê gotarê de emê riya kin û serast a rojanekirina guhertoyan rave bikin.

Niha em ê van gavan yek bi yek binivîsin.

1-Ji malpera www.pckurd.net, ji beşa Daxistin'an ji xwe re php-nuke 7.6 daxe.

2-Dosiya ku te daxist ji hundir "zip" derxe.

Ji bo tu mezin bikî, wêne bitikîne.

3-Niha hemû dosiyên di hundir peldanka "Html" de hene, bigire û bavêje ser pêşkêşkera (server) xwe.

4-Di hundir pakêta php-nuke 7.6 de, bi navê "upgrades" peldankek heye. Li hundir wê peldankê binihêre, hundirê wê wiha ye.

5-Di hundirê "upgrades" de ji bo her guhertoyekê dosiyek heye. Mînak, niha ji ber ku te php-nuke 7.1 bi kar aniye, divê tu têkevî hundirê 7x û li hundirê wê binihêrî. Di hundirê wê de ev dosî hene:

upgrade70-71.php
upgrade71-72.php
upgrade72-73.php
upgrade73-74.php
upgrade74-75.php
upgrade75-76.php

Niha tu jî peldankeke bi navê "upgrades" di hundir pêşkêşkera xwe de çêke. Û van dosiyên di hundirê 7x de hene, ku me navê wan li jor rêz kiriye, hemûyan bavêje hundirê wê dosiya xwe ya bi navê "upgrades"

7-Tiştekî ku tu zêde bikî nemaye.

Îcar em bêjin navê malpera te www.pckurd.net e. Divê tu di cihê navnîşanê yê Browserê de wiha binivîsî:

www.pckurd.net/upgrades/upgrade71-72.php

Piştî te wisa nivîsî, ENTER bike.

Heke pirsgirêkek tune be, dê di dîmendara te de tiştekî wiha xuya bibe.

Niha ji bo dosiya din jî wiha binivîse û ENTER bike:

www.pckurd.net/upgrades/upgrade 72-73.php

Bi vî rengî heta tu hatî 75-75'ê bidomîne.

Êdî te xwe gihande guhertoya herî nû. Niha tu dikarî hemû dosiyên di hundirê peldanka "upgrades" de bavêjî û jê bibî.

Hemû pirs û pirsgirêkên xwe di www.pckurd.net de, di beşa foruman de binivîsin.

Serkeftin.

## Di PHP-NUKE de ewlekarî

Rizoyê Xerzî | PCKurd

Hemû pirs û pirsgirêkên xwe di beşa me ya Guftûgoyan de binivîsin, em alîkariya we bikin.


Ez bawer dikim gelek tiştên li ser ewlekariya Php-Nuke hatine nivîsîn serê we gêj kiriye. Belkî gelek kes hene ku her roj ji tirsa xirakirina malpera xwe ranazin. Ezê di vê gotarê de riyeke ewlekariyê ji bo we bînim zimên.

Lê ezê vê gotarê ji bo Php-Nuke 7.7 binivîsim. Li gor ku ez dizanim Php-Nuke 7.7 bi kurdî qediyaye û dê PCKurd.Net wê jî biweşîne.

Ezê vê gotarê li ser ewlekariya dosya admin.php binivîsim. Lewre min ceriband û min fêm kir ku navê dosiya "admin.php" tê guhertin û dema ku hate guhertin jî bidestxistina wê dijwartir dibe.

Ji bo vê yekê divê tu hem navê "admin.php" biguherî û mînak; bikî "celadetbedirxan.php" û her wiha têkevî hundir dosiya config.php û di wir de rêzika

....



$admin_file = "admin";

....

bibînî û wiha biguherînî

...

$admin_file = "celadetbedirxan";

...

Heke mirov wisa bike, ez bawer im ji bo ewlekariya dosiya admin.php gaveke mezin tê avêtin.

Ji bilî vê riyê, mirov dikare "Admin secure 1.7" saz bike û ewlekariya xwe zêdetir bike. Ezê di gotareke din de li ser wê jî binivîsim.

Ji bo pirsên xwe li beşa guftûgoyê binivîsin.



Rêzan Tovjîn
rezan@pckurd.net

# Dersên PHP'ê

R. Lerdorf, di destpêka dîroka înternetê de, wate di wan salên 1990'î de ku hîn înternet nû belav dibû de, ji xwe re li karekî digeriya. Fikirî ku kurtejiyana xwe di rûpelekê de binivîse û dema çû ji bo kar serî li derekê da, vê navnîşanê bide wan. Lê wan deman, bi taybetî jî di tora Unix a zanîngehan de ku pêşkêşkerên web hatibûn sazkirin, çêkirina rûpeleke şexsî ne karekîhêsan bû.

Kî rûpelekê ji xwe re çêke û têxe pêşkêşker, heke roja yekem lê hay nebe jî, roja duyem dê meraq bike bê çend kes ketine malpera wî, çi fikirine û xwestine jê re çi bibêjin. Lerdorf kurtejiyana xwe xist pêşkêşker û wî jî meraq dikir ku çend kes vê kurtejiyana wî dixwînin. Wan salan di hindurê wê de motoreke berhevkar hebû ku yek-du makro fêm dikir. Çend amûrên ku di piraniya malperên şexsî de hene; lênûska mêvanan, hejmarok û hwd tê de cih digirt. Lerdorf di sala 1994an de li ser vê meraqa xwe PHP (Personel Home Page) bi pêş xist..

Beşeke mezin a vê nivîsbariyê ji zimanê Perl hatibû standin. Navê Personel Home Page (Serûpela Şexsî) lê kiribû. Vê nivîsbariyê gelekî bal kişand û hate bikaranîn.

Lerdorf pêvekên ku wekî form daneyên ji serîlêderan hatine berhev dike nivîsî. Navê vê bernameyê bû PHP/FI (Form Interpreter / Şîrovekarê Formê). Hinekan navê PHP2 li vê guhertoya bernameyê kir. Ev nav, tevî ku bername gelekî guherî û bi pêş ket jî demeke dirêj neguherî.

Lerdorf di 1993an de motora berhevkar ji nû ve nivîsand. Navê wê bû PHP/FI V2 Vê guhertoyê formên agahiyan ên HTML bi kar dianî. Dema desteka mySQL jî li vê yekê zêde bû, PHP/FI êdî ji dayika xwe bû.

Pêşî ji gel re ne vekirî bû. R.Lerdorf fikirî ku ev nivîsbariya ku ji bo xwe amade kiriye ji aliyê kesên zêde webê nasnakin ve jî dikare bi hêsanî were bikaranîn. Di sala 1995an de bi navê "Personel Home Page Tools" li gel hate vekirin. êdî gelek kesan destek dayê û kod ên wê bi hevkarî bi pêş xistin. Ji lew re bi lez bi pêş de çû.

Rasmus Lerdorf di nîvê sala 1995an de komek ava kir. Di vê komêde Zeev Suraski, Stig bakken, Shane Caraveo û Jim Winstead hebûn. Heta wêdemê PHPê ji "Perl"ê deyndariyeke dewamî dikir. Vê komê PHP ji vî awayî rizgar kir. PHP kirin (Object-Oriented) "Berêveyî Bireser." Ew êdî zimanekî bernamekirinê yê bi vî rengî bû. Ev kom ji bo kêrhatinên dîtir li PHPê zêde bike, hey xebitî.

Di 1997an de Zeev Suraski û Andi Gutmans motorê berhevkar bi tevahî ji serî de nivîsandin û ji bo PHP V3 bingehek çêbû. Dû re jî PHP V4 ji serî ve hate nivîsandin. PHP Hypertext Processor ji bo serkeftinan amade bû.




Li Tirkiyeyê cara yekemîn bi malpera Azadiya Welat, ku Serhad Ronahî amade kiribû, ji aliyê kurdan ve PHP hate nasîn. Wê demê li dinyayê PHP bi lez û bez belav dibû.

## PHP Çi Ye?

PHP zimanek ji zimanên bernamekirina webê ye. Her wiha, cihê ku herî pir lê tê bikaranîn jî web a herî mezin, ango înternet e. Di înternetê de daneyên rûpelan, bi bikaranîna protokolên belî ji deriyekî komputerê dihere yê din.

Ev çûn, an jî ev birin, li ser bingeha TCP/IP pêk tê. HTTP (Hyper Text Transfer Protokol) jî dibe pûl a li ser vê nameyê.

Dema tu dixwazî www.malperamin.com vekî, komputera te ji pêşkêşkera ku wê rûpelê pêşkêş dike re nameyekê dişîne, wekî daxwaz. Ev daxwaz ji aliyê pêşkêşker ve tê bersivandin. Ji danûstandinê re bi kinasî wiha tê gotin "daxwaz-bersîv."

PHP wekî Linuxê xwedî zagonên "Pergala Vekirî" ye. Ango bi van zagonan vegirêdayî ye. Her kesê ku dixwaze, dikare guhertinan li gor zanebûna xwe lê zêde bike. Lê nikare ji vê guhertinê pereyan qezenc bike. Divê guhertinên xwe ji her kesê ku dixwaze re eşkere jî bike.

Ji bo kesên ku CC++, Pascal, heta Visucal Basic dizanin, hînbûna PHP'ê bi tenê danekî rojê digire. Lê kesên ku van zimanan nizanin, belkî çend danên rojê ji bo wê veqetînin. PHP, zimanekî Scriptê ye; wate, kod ên wê wekî dosiyên nivîsê tên tomarkirin û li cihê ku dê were bikaranîn, ji aliyê şirovekarê ve tê şîrovekirin.

Ev tê wateya çi? Ev tê wateya ku ji bo tu bernameya te bi PHP'ê nivîsiye berhev bikî, yanî wekî EXE bikî dosiyeke ku dikare bê xebitandin, pêwistiya te bi derxistina dosiyeke din tune. Lê ji bo tu bikaribî Scriptên xwe yên PHP bixebitînî, pêwistiya te dê bi bernameyeke ku zimanê PHP'ê bizane çêbibe. Ev bername dikare bi serê xwe (di paceya fermanxwaz de an jî di termînala dîmenderê de) jî bixebite. Lê bi tevahî em bêjin ku divê ji aliyê Pêşkêşkerê Webê ve bikaribe bête xebitandin. Bi gotineke din, divê mirov bike ku Pêşkêşkerê Webê were radeya ku ji PHP'ê fêm bike.

Şîrovekarê PHP'ê, îro li ser teknolojiya Scripta ku jê re 'kakilê-Zend' tê gotin, ji aliyê Zeev Suraski û Andi Gutmans ve, ji serî ve, bi tevahî ji nû ve hatiye nivîsîn. Zend, teknolojiyeke wisa ye, ku wekî Windows Script Host û mesela Visual Basic for Applications (VBA), îmkanê dide Pergala Xebatê ku bernameyên pê hatine nivîsîn bikaribe bixebitîne.

(Der barê Zendê de mirov dikare agahiyên bêhtir ji www.zend.com'ê bigire.)

Îro navê fermî yê vî zimanî wekî 'PHP: Hypertext Preprocessor' (Pêş-pêkanînerê Hiper-nivîsê) hatiye guhertin. Û ji bo gelek Pêşkêşkerên Webê bikaribin zimanê PHP'ê fam bikin, şîrovekarên pêwist ji nû ve hatin hilberandin. Di 20'ê rêbendana 2000'an de konferansa yekemîn a PHP'ê li Israîl pêk hat û ceribandina guhertoya 4'emîn hate pêşkêşkirin.

Êdî tu dikarî rûnî û bi PHP'ê bernameyeke xwedî her bikêrî binivîsî; wate PHP hatiye asta ku bi serê xwe herêmên sepanê bibîne. Bi gotineke din, bi PHP'ê êdî mirov dikare hem bernameyên lîstikan binivîse, hem jî rêveberiya danegirê binivîse. Hema hema mirov dikare pê her cure bernameyan binivîse.

Di vê pirtûka biçûk de, aliyê PHP'ê yê ku me têkildar dike, PHP zimanekî bernamenûsiyê ye ji bo mirov bikaribe hinek karan bi Pêşkêşkerê Webê bide kirin. Hema wekî






Amed Ç. Jiyan
amed@pckurd.net

# Linux Ubuntu

Linux ku dendikeke pergala xebitandinê ya ji bo komputeran e, nivîsbariyeke azad e û kodên wê vekirîne. Çêkirina Linuxê di sala 1991'ê de, ji hêla Linus Torvaldsê Fînlandî ve, dema ku li Zanîngeha Helsinki li ser endezyariyê perwerdehî ditît, hatiye destpêkirin. Piştî ku Linus Torvalds çêkirina Linuxê da destpêkirin, li ser înternetê danezanekê weşand û li dû vê danezanê ji tevahiya cîhanê, bi piştgiriya gelek bernamesazan bi lez û bez pêş ket û hê jî bi heman awayê pêşketina xwe didomîne. Di demeke kin de, bernameyên azad ku ji bo GNU hatibûn amadekirin, ji bo ku di dendikê Linuxê de jî bixebitin, ji nû ve hatin sazkirin û pergaleke xebitandinê ku bihêz û vezgir derkete holê.




Ubuntu bi kurdî derket. Mirov dikare ji malpera wê belaş daxe û saz bike. Di Avrêla sala 2006'an de bi dê kurdiya wê nûtir û xirtir bibe. Koma Pc Kurd hîn li ser gelek xebatên bi vî rengî dixebitin.

Piştî vê hevkariyê, ev pergala xebitandinê, wekî GNU/Linux hate binavkirin lê ji berk u bilêvkirina LinuxÊ hêsantir e, nav wekî Linux ma.

## Belavkirina GNU/Linux

Niha, gelek xebatên ku nivîsbariyên GNU û nivîsbariyên din ên azad tînin cem hev û van bi dendikeke Linuxê, biawayekî sererastbûyî belav dikin hene.

Debian, Fedora, Gentoo, Mandriva, Pardus, Redhat, Slackware, SuSE û Ubuntu, tenê çend hebek ji wan ku zêde tên nasîn in. Hemû, bi awayekî ku hemû bikarhênerên komputeran dikarin bi awayekî hêsan saz bikin, tên belavkirin. Ev nivîsbarî, arşîvên nivîsbariyê yên endezyariyên komputeran û ji malperên ku belavkirina van nivîsbariyan dikin, peyda dibin.

## Saziyên Ku Piştgirî Didinê

Niha, nêzî tevahiya navendên agahî û kiryariyan ên zanîngehan û dezgehên wekî NASA, IBM, HP, Boeing, HSBC, SonyEricsson, Nokia, Siemens, Samsung, General Motors, Hyundai, Oracle, EToys Linuxê bikartînin î bi awayekî piştgiriyê didinê.

Linuxên Ku Li Kurdî Hatine Wergerandin

Xebatên wergerandina Linuxê ji bo zimanê kurdî, ji hêla Koma PC Kurdê ( www.pckurd.net ) ve tên meşandin û bi taybetî keda Abdullah Ulaş, Amed Ç. Jiyan, Erdal Ronahî, Kadir Dilsiz, Rêzan Tovjîn û Rizoyê Xerzî tê de heye.

Hemû kesên ku dixwazin tevli vê xebatê bibin, dikarin bi malpera http://ferheng.org/linux/linux.html an jî www.pckurd.net ê re bikevin têkiliyê.

Mandriva (an jî Mandrake)

## Ubuntu


UBUNTU

Ubuntu di zimanê Efrîkaya Başur de tê wateya "ez, ji ber ku tu tu yî, ez im". Sazkirina Ubuntuyê gelek hêsan e. Ubuntu Debianê ji xwe re wekî bingeh distîne û xebatên wê ji aliyê Canonical Ltd. ve tên meşandin. Ubuntu, her 6 mehan carekê, guhertoyeke nû derdixe û 18 mehan piştgiriyê dide guhertoyan.

Ubuntu, bi sazbûna xwe ya hêsan, ji SuSe Linux, Mandrake Linux û Fedora Coreyê çêtir tê hesibandin. (Sazkirina wê tenê tikandina "enter"ê ye.)

Piştî sazkirinê heke ji malpera http://www.ubuntuguide.org ê bê şopandin; hemû bernameyên ku bi bingeha Javayê dixebitin, taybetiyên Mozilla Firefoxê yên wekî temaşekirina videoyên bi codecên Windows Media, bernameyên p2p yên wekî limewire û emule dê peyda bibin.

Guhertoya Ubuntuyê ya 4.10




Wekî di wêne de jî tê dîtin her tişt li kurdî nehatiye wergerandin. Her roj hejmara kurdên ku ji vî karî fam dikin zêdetir dibe û kar çêtir dimeşe.

Warty bi 2.8.0 Gnome û 1.1.2 Openofficeyê tê. Taybetiyeke din a Ubuntuyê ew e ku Ubuntu ji bo kamerayên digital automount bikar tîne û piraniya kamerayên digital dema ku bi komputerê ve bên girêdan, li ser masê diska xwe didin nîşandan û ji bo xebatê amade ne.

Ji ber ku Ubuntu, hemû taybetiyên Microsoft Windowsê (yên baş) li dû sazkirineke ku 20-30 deqîqe dem digire, tîne berdestan, di demeke kin de kete nava Linuxên herî navdar.

Ji ber ku Ubuntu wekî pergala pakêtan APT'eya (Advanced Package Tool) Debianê bikartîne, piştî firehkirina repertuarê ji bo bikaranîna nêzî 150 hezar bernameyan destûrê dide. Ji malpera Ubuntuyê ya fermî cdyên sazkirin (install) û zindî (live) bê pere û bê sînor tên belavkirin û heya ber deriyê we ji we re tên.

Rûpela daxistinê Ubuntu (her dem guhertoya herî dawî)

" http://www.ubuntu.com/download/

CD ya sazkirinê / Install CD

" Ji bo Pentium û AMD32:

ISO: http://releases.ubuntu.com/5.10/ubuntu-5.10-install-i386.iso

Torrent: http://releases.ubuntu.com/5.10/ubuntu-5.10-install-i386.iso.torrent

" Ji bo AMD64: http://releases.ubuntu.com/5.10/ubuntu-5.10-install-amd64.iso

CD ya zindî / Live CD

" Ji bo Pentium û AMD32

ISO: http://releases.ubuntu.com/5.10/ubuntu-5.10-live-i386

Torrent: http://releases.ubuntu.com/5.10/ubuntu-5.10-live-i386.iso.torrent

" Ji bo AMD64: http://releases.ubuntu.com/5.10/ubuntu-5.10-live-amd64.iso

Girêdana ji bo pirs û bersîvên di derheqê Ubuntuya Kurdî de : https://wiki.ubuntu.com/Pirs%c3%bbBersiv

Çavkanî:

1) http://www.ku.wikipedia.org

2) http://ferheng.org/linux/linux.html

3) http://www.tr.wikipedia.org

Amed Çeko Jiyan amed@pckurd.net, http://www.pckurd.net, http://www.hemdem.com

# Divê em bingehan daynin






*Bi taybetî di warê xebatên kurdî de Şaredariya Sûrê bal kişand. Cara yekem îsal li Tirkiyeyê we Pêşbaziya Çîrokên Zarokan bi kurdî û tirkî çêkir. Ev ji bo kurdî yekemîn car bû. Tevî hemû kêmasiyan jî yekemîn bû û dê ji bo pêşerojê bibe bingehek. Her wiha niha bi weşana Kovara PcKurd re derket holê ku xebatên we bi qasî salekê ye der barê komputerê de jî hene û gelek bername li kurdî û tirkî hatine wergerandin. Lê ji bo kurdî ev jî yekemîn e. Gelo we çima edebiyata zarokan û komputer hilbijart?*

A. Demirbaş: Li gor baweriya min zarok bingeha ziman in. Zimanê teknolojiyê jî her wiha beşeke girîng a pêşketina ziman e. Em wekî Şaredariya Sûrê, ji xwe re bingeha Ji Bo Şaredariyan Pirzimanî datînin. Li ser vê bingehê em bawer dikin ku divê bi zimanên heyî xebat werin kirin. Di her warî de. Ne tenê edebiyata zarokan û komputer. Lê ev herdu beş gelekî girîng in.

Ji bo pêşxistina edebiyata zarokan em Kovara Şemamok derdixin. Bi baweriya min ne girîng e ku yekemîn e, an na. Lê destpêk e. Çima em dibêjin destpêk e? Yanî em dibêjin îdiaya me ne ew e ku em ji her kesî çêtir çêdikin. Na! Em ji tunebûnê çêdikin. Ji ber ku tune ye, em vê xebatê dikin. Lê dîsa jî Şemamok bi kalîteya xwe bala herkesî kişand. Ez bawer dikim dê di dîroka edebiyata zarokan de jî cihekî girîng bigire.

Lê di warê komputergeriyê de ne wisa ye. Ew organîzasyoneke girantir e. Ne karê me ye jî. Lê destek bi qasî ku ji destê me tê, tê kirin. Karger di vî warî de saziyeke fermî ye, li gor vê yekê hatiye avakirin û karê wê ev e. Em jî dixwazin di vî warî de xebata wê destek bikin. Lewre kesên ji vî karî fam dikin tê de hene û ew xebata xwe bi vî rengî dimeşînin.

*Çima Nivîsbariya Azad*

A. Demirbaş: Li Ewropayê Nivîsbariya Azad gelekî tê destekirin. Ew wekî pêşeroja xwe dibînin. Li Tirkiyeyê bi piranî saziyên fermî û ne fermî hemû jî bernameyên ne azad dikirin. Li dinyayê hejmara mirovên ku pereyan didin karên wiha her diçe hindiktir dibe. Li Tirkiyeyê ev sektor xurt e. Lê niha cara yekem e ku em wekî şaredarî destekê didin Nivîsbariya Azad. Desteke ma ev e, gotin e, em dixwazin Nivîsbariya Azad ji aliyê kurdan ve û mirovên herêmê ve were nasîn û bikaranîn.

Li dinyayê hejmara dewletên ku Nivîsbariya Azad bi kar tînin her diçe zêdetir dibe. Li Tirkiyeyê jî dê ev yek bibe. Lê zû, an jî dereng, ew nayê zanîn.

*Di Warê xebatên din ên çand û hunerî de hûn niha li ser kîjan projeyan dixebitin?*

A. Demirbaş: Ji serî ve em hewl didin ku nava Sûrê bikin Muzexaneyeke Vekirî. Ev karê salan e. Karekî giran e. Aboriyeke mezin, destekeke mezin jê re divê. Lê heke pêk were, dê Diyarbekir bibe navenda turizmê. Bifikirin ku Muzexaneyek heye ku dora wê bi Sûrên dîrokî hatiye girtin, di hundirê wê de bi dehan xaniyên dîrokî hene, kuçeyên dîrokî, dêr, sînegog, mizgeft, rê, fayton û hwd. Dê mirov bi saetan di hundirê vê Muzeyê de bigerin, dê bi rojan tê de bigerin.

Heke em ne li Tirkiyeyê bûna, heke em li dereke din a dinyayê bûna, dê ji zû ve ev Muzexaneya Vekirî ava bûbûna. Em çûn û me li Îspanyayê dît. Wan çêkiriye. Salê 3 milyon tûrist diçin bajarê wan û li wî bajarê dîrokî digerin.

Li ber çavên me jî Diyarbekir heye, qedîm e, dîrokî ye. Lê çi heyf ku her roj bêhtir xira dibe, bê xwedî ye. Ku em dîrokiya vî bajarî bingeh bigirin, dê aboriya mirovên vî bajarî jî baştir bibe. Lê bala min dikişîne ku mirov li pey projeyên rojane ne. Ji bo pêşerojeke dûr dema mirov diaxive zêde bal nakişîne. Kes naxwaze li ser projeyek ji bo 10 salên pêşde tiştekî bike. Ev divê were rexnekirin. Ev 2 sal in em vê gav bi gav pêk tînin û ez hêvîdar im ku emê bi ser bikevin. Em hemû tên û diçin, lê divê ev bajarê dîrokî bijî.

*Hate gotin ku îsal Pêşbaziya Çîrokên Zarokan çênabe. Ev yek bi xemgînî hate pêşwazîkirin. Gelo rast e?*

A. Demirbaş: Rast e. Lê biryar ne biryara me ye. Biryara gel e. Heke gelê Diyarbekirê, derûdorên edebiyatê bixwazin ev yek bidome û serî li me bidin, hêj ne dereng e. Mirov dikare jûriyekê dîsa ji bo îsal hilbijêre û dest bi xebata wê bike. Ev li gor daxwaza gel e.

Lê heke daxwazeke bi vî rengî tune be, em dixwazin îsal pêşbaziya xwe dîsa ji bo zarokan, lê di warê çand û hunerê de pêk bînin. Wekî wêne, xebatên hunerî û hwd.



# Opera bi ewlekariya xwe bal dikişîne



Rizoyê Xerzî
riza@pckurd.net

Em bawer in piraniya kurdan Internet Explorer bi kar tînin. Ji ber vê yekê jî danasîna Opera dê ji bo bikarhênerên kurdan balkêş be. Lê li ber destê me heta vê rojê wekî gerok (browser) bi tenê Opera heye. Hem bi kurdî ye, hem jî belaş dikare bi dest bikeve. Lê ne nivîsbariya azad e.

Cara yekem Opera 7.53 bi kurdî derket. Ew bi desteka rojnameya Azadiya Welat ve ji aliyê Rêzan Tovjîn ve hatibû wergerandin. Di tîrmeha 2004'an de bi kurdî hate weşan. Wê demê bernameyek bi vî rengî berfireh, bi tîpên latînî û kurdî tune bû. Ji ber vê yekê mirov dikare bêje cara yekem kurdî bi riya Operayê hate ceribandin.

Opera wekî Internet Explorer, Mozilla û Mozilla Firefox gerokek (browser) ji bo înternetê ye. Taybetiya Opera biçûkbûn û lez e. Lê her wiha ji aliyê ewlekariyê ve îro li dinyayê bala bikarhêneran dikişîne. Hêjayî gotinê ye ku mirov bêje, tevî ku ewlekariya wê gelekî baş e jî, li dinyayê ji Internet Explorer û Firefox hindiktir tê bikaranîn.

Internet Explorer jixwe di her komputera ku Windows tê de hatibe barkirin de heye. Ji ber vê jî zêdebûna bikarhênerên wê normal e. Firefox jî, ji ber ku belaş e, zû dixebite, ewlekariya wê jî baş e, pir tê xebitandin. Lê Opera bi 39 dolaran tê firotin û di nav tu sîsteman de nîn e. Divê mirov bixwe ji înternetê daxîne û bi kar bîne.

Di operayê de, dema tu dikevî malperan, paceyên vekirî li jêr xuya nakin, ew li jor dibin rêz. Tu dikarî hemûyan bi hev re jî bigirî, tu dikarî yek bi yek jî bigirî. Her wiha tu dikarî darikê amûran bi hêsanî li gor xwe amade bikî. Wekî di wêne de xuya dike me li gor dilê xwe darikê amûran ava kiriye. Her kes dikare bi hêsanî li gor xwe amade bike.

Dema mirov bi mişkê çû ser darikê amûran û bi bişkojka rastê tikand, pêşeke kurdî vedibe. Malpera ku tu dixwazî navê wê her dem li wir bimîne û kengî te tikand demildest vebe, li wir deyne. Heke tu bêjî Ji Darikê Amûran Rake dê ew malper ji wir rabe. Heke te xwest tu yeke din daynî wir, hingê malpera te divê veke û bi mişkê paceya wê bigire û bibe cihê te divê li wir were bicihkirin. Evqas hêsan e.

Dema te xwest tu wêneyekî ji malperekê bigirî, hingê here ser wêne û bişkojka rastê ya mişk bitikîne. Pêşekek vedibe, li wir Wêne Tomar Bike bitikîne.

## Bijare

Bi zimanên ewropî favorite. Yanî malperên ku tu pir vedikî, an jî jê hez dikî. An jî malpereke ku tu ditirsî tu navê wê ji bîr bikî. Bijare ji bo vê yekê ye. Malpera ku te vekir têxe nav bijareyan. Êdî ew li ber destê te ye.

Mirov dikare bijareyan li gor dilê xwe dûre dîsa serast bike. Bişkojka ratê bitikîne û bêje Bijareyan Serast Bike. Pacyeke nû vedibe. Jixwe her tişt bi kurdî ye û tu dikarî bi hêsanî li gor dilê xwe amade bikî.

Opera heta niha wekî sazkirin (Install) bi kurdî nîn e. Bi tenê guhertoyên (versiyon) kevin ji aliyê Kadir Dilsiz ve hatibû avakirin. Lê guhertoyên nû wekî sazkirin nîn e.

Hûn dikarin niha Opera 8.5 bi kurdî ji malpera pckurd.net bi dest bixin:

1- Here malpera opera.com û bernameyê daxe, saz bike. Ew bi îngilîzî ye.


2-Dûre ji pckurd.net ji beşadaxistinê dosiya zimanê kurdî jî bo Opera 8.5 daxe


3-Dosiya ziman têxe hundir C: Program Files/Opera

4-Niha Opera veke û ji nav pêşekê (menu) Tools'ê veke, di wir de jî Preference veke. Di paceya Preference de Deails bitikîne û dosiya zimanê kurdî ya di hundirê C'yê de nîşan bide.

5- Li wir lîsteya hemû zimanan heye, kurdish hilbijêre.


6- OK bitikîne.




Niha hûn dikarin vê bernameyê êdî bi her awayî bi kurdî bi kar bînin.

Ji bo alîkariya teknîk di malpera pckurd.net de têkevin beşa forumê û pirsgirêka xwe binivîsin.














# PHP Nuke nas bike

PHP-Nuke nivîsbariyeke azad ji bo cêkirina siteyên înternetê ye.

Îro di internet de sîstema PHP-Nuke zûtirîn di nav malperan de tê bikaranîn. Ev sîstem bixwe serbest tê belavkirin. Bi yek pakêtekê hatiye pêşkêşkirin.

Xwediyê sîstema PHP-Nuke malpera phpnuke.org e. Ji wir ew tê belavkirin û nûkirin. Guhertoyên (versiyon) nû dem bi dem têne belavkirin. Nivîsbariya azad e, lê ne belaş e. Guhertoyên nû bi 10 dolaran tên firotin.

PHP-Nuke bixwe sîstemek serbixwe ye. Ew bi MySQL dixebite û bi PHP-MyAdmin tê amadekirin. MySQL bixwe tenê li pêşkêşkerê (server) tê bicîhkirin, jixwe amadekarê pêşkêşkerê MySQL pêşî bixweber bi cih dike. PHP-MyAdmin ji bo kontrolkirina naveroka sîstema malperê ye. PHP-Nuke tenê bixwe sîstem e, tê de nivîs û pel nayên parastin. Naveroka malperê ango sîstemê di pela SQL de li ser PHP-MyAdmin tê parastin û nivîsandin. Emê bêhtir li cihekî din li ser MySQL û PHP-MyAdmin bisekinin.

PHP-Nuke bixwe bi pakêtek yekgirtî tê belavkirin, lê pakêtên din jî hene. Ew jî li ser bingeha zimanê PHP'ê hatine nivîsandin, lê xweser in û tiştên cûda pêşkêş dikin. Li aliyekî din jî, ji bo PHP-Nuke, tu çi bixwazî pêve bikî, dîsa tu dikarî bi dest bixî. Me pêşî got, PHP-Nuke bixwe sîstema bingehîn e, lê ji bo wê sîstemê bêhtir "pakêtên" din hene. Mînak, di PHP-Nuke de forumek bîngehîn heye, lê e-kart tê de nîn e. Tu dikarî e kartê pêve bikî.


## PHP-Nuke çi pêşkêş dike?

Ne derew e, mirov bibêje: "tu çi bixwazî pêşkêş dike." Tenê tu bizanibe lê bigere û bibîne. Îro PHP-Nuke bêhtir ji bo forum, panel, portal û malperên nûçeyan tê xebitandin. Di PHP-Nuke de xwenûkirin (Register) heye. Tu dikarî bibî endamê malperê û tu dibî xwediyê beşa xwe.

Çend mînak li ser hebûn û nebûnên PHP-Nuke: Nûçeşandin, Nûçenivîsandin, Beşa Nivîskaran, Beşa Dokûmentan, Beşa Endaman, Arşîv, Beşa Grêdanan, Beşa Programan, Lêgerîn hwd...

## SQL INJECTIONS: Ve nivisê bi diqat bixwine!

Di PHPNuke de gelek sql injections (kêmasiyên ewlekariyê) hatin dîtin, xiraker (hacker) bi vî rengî gelek caran malperên kurdî xira kirin, pirsgirêk ji "mainfile.php" û ji modula "WebLink" ê derketiye, ji bo wê, ku hûn bi PHP Nuke bixebitin û malpera we bi PHP Nuke hatibe çêkirin, jibîr mekin! Herdem guhertoya xwe nû bikin, ji http://php-nuke.org ê.




De mirov dikere beşa gerînende (rêveberî) mirov dibîne ku ji bo her tiştekî modulek tê de heye û li binê wan jî bi kurdî hatiye nivîsîn ku ew çi ne...

## PHP-Nuke ji bo Bikarhêneran/Endaman

Di PHP-Nuke de servîsek ji bo endamiyê heye. Her kes dikare xwe bi e-peyama xwe tê de tomar (qeyd) bike. Tu dibî endamekî tomarkirî û tu dikarî di malperê de kar bikî. Wekî bikarhênerekî/ê, tu dikarî di foruman da bi navê xwe binivîsî, li ser nûçeyan nêrîna xwe binivîsî û dengê xwe bidî. Li aliyekî din jî, tu dikarî bi endamên din re serbest mijûl bibî, peyaman (mesaj) binivîsî û pê re "sohbet" jî bikî.

## PHP-Nuke ji bo Birêveberan/Xwedî

Xwediyê malperê dikare pergalê (sîstem) her roj nû bike, nûçeşandin jixwe ji ser malperê dibe. Wênepêvekirin dîsa ji FTP'ê jî dibe û li ser malperê jî rê ji bo şandinê heye, bi tenê, li vir hinek "Script" pêwist in, ew jî jixwe serbest di Înternetê de têne belavkirin. Xwediyê malperê dikare malpera xwe bêtirs ji êrîşkaran jî biparêze, her roj û her hefte "BackUp" ava bike û naveroka malpera xwe veşêre. Birêvebirina malperê di destê "te" de ye, lê tu dikarî hevalan jî tevlî karê xwe bikî.

## PHP-Nuke "Modules & Blocks"

Pergala pakêta PHP-Nuke ji du aliyên taybet ve hatiye avakirin. Yek, modul in ango servîsên malperê ne û yek jî stûn (block), ev jî li ser malperê wan servîsan rava dike. Modûl bixwe nayên dîtin, lê blok li aliyê çep û rastê têne xuyakirin. Modûlên malperê jixwe sîstema malperê ne, lê belê, blok tenê jixwe girêdayî modulan e, tenê modulan pêşkêş dikin modulan e.

Mînak: /modules/Your_Account Ev modulek e û ji bo beşa endaman e. Jixwe cihê bikarhêner e jî.

Mînak: blocks/block-Login.php Ev dibe stûnek. Ev bixwe li ser malperê cihekî rava dike, ji wir tu dikarî xwe di malperê da tomar bikî bikî yan jî bi navê xwe têkevî malperê.

## Zimanê Kurdî û PHP-Nuke

PHP-Nuke bixwe bi zimanê îngilîzî hatiye pêşkêşkirin. Lê tê de niha wekî zimanên din kurdî jî heye. Pakêta zimanê kurdî tenê ji bo sîstema bingehîn hatiye amadekirin. Jixwe, ev sîstema pêşî ye, bêhtir tu modul û stûnan pêve bike, jixwe ji bo wan rûpelên ziman cuda tê avakirin. Niha pakêta zimanê kurdî ji bo sîstema PHP-Nuke heye û tê de ji bo forumê phpBB2 jî heye. Herdu bi hev hatine girêdan.

## Alîkarî:

E-pirtûkek li ser PHP-Nuke bi kurdî heye û mirov dikare ji malpera pckurd.net daxe. Her wiha mirov dikare guhertoyên nû yên kurdî jî ji vê malperê daxe. Heke pirsgirêkeke we çêbû, di beşa forumê ya malpera pckurd.net de binivîsin û alîkariyê bixwazin.


## Ferhenga Komputergeriyê

Di vê serdema ku em tê de ne, hemû pêşketinên gelan li gorî pêşketinên teknolojîk tên pîvan. Wekî tê zanîn ; teknolojî dereng hat welatê me. Ciwanên ku niha temenê wan di navbera 20 û 25'an de ye, roja ku yekem car elektrîk, televizyon, sarinc û tiştên ku têkildarî elektrîkê ne hatin mal, gund an jî bajarên wan bibîr tînin. Roja ku cara yekem elektrîk hate welatê me, li hin welatan weşanên televizyonan xwe gihandibûn heya nava malên gundan. Gelo di roja îro de, li Ewropayê çend kes yekem weşana televizyonê a li bajarê xwe bibîr tîne?

Îro teknolojî wxe di nava peyva înternetê de veşartiye. Pêşketinên gelan xwe ji pêşketinên di hêla teknolojiyê de didine xuya kirin. Pêşketina teknolojiyê jî bi pêşketina înternetê ve girêdayî ye.Em di pêvajoyeke gelek girîn de ne. Her çiqas jî elektrîk û teknolojî dereng gihabe me, di roja îro de em neçar in ku - wekî hemû gelan- sûdê jê wergirin.

Bi rastî; gelê me bi awayekî germ bi înternetê re têkildar e. Li ser înternetê bêherjmar malperên kurdan hene, lê hezar mixabin, hemû bi zimanên biyan in.

Tiştê ku divê bê kirin ew e ku înetnet, bi hemû awayên xwe ve li kurdî bê wergerandin. Dema ev bê kirin divê bi awayekî baş li ser bê rawestin û wergerên ku tên kirin divê li gorî standardekê bin. Ji bo vê yekê jî, divê haya kesên ku bi vî karî re têkildar in ji hev û din hebe û wergerên xwe li dû nîxaşan bikin. Ji bo vê yekê ez çêkirina ferhengekê pêşniyar dikim. Dixwazim ku hemû peyvên ku di wergeran de diborin, di beşa "Ferhenga Komputergeriyê" de hem bi awayên xwe yên orjînal hem jî bi kurdî bên nivîsandin. Kesên ku hez dikin dikarin tirkî, almanî, fransizî an jî bi zimanekî din jî binivîse.






# Nivîsbariya Azad

Armanca sereke ya Nivîsbariya Azad ew e ku bernameyan belaş bigihîne hemû gelan, her bername bi her zimanî hebe, kod ên wan ji her kesî re vekirî be, da ku her kes bikaribe tiştekî lê zêde bike. Ji lew re jî bernameyên nivîsbariya azad ji her alî ve azad in.

Her kes dikare Nivîsbariyên azad bifiroşe jî, lê ji ber ku jibergirtina wê serbest e, kes zêde pereyan tê nade.

Heta niha çend bernameyên Nivîsbariya Azad li kurdî jî hatine wergerandin û di vî warî de komek bi navê Koma PCKurd di sala 2005'an de bi armanca ku van xebatan wergerîne kurdî hate avakirin.

Ji bo Nivîsbariya Azad (en:free software) çend krîter hene:

Azadiya bikaranina nivîsbariyê ji bo her armancê.

Azadiya xwendina çavkaniyên nivîsbariyê (sourcecode).

Azadiya zêdekirin û belavkirina nivîsbariyê.

Azadiya guherandina nivîsbariyê û weşandina guhartinan.

Nivîsbariya azad bi piranî bêmize (bê ucret) ye, lê ne her dem. Lê nivîsbariya bêmize ne her tim azad e.

Yek ji avantajên nivîsbariya azad ew e ku bi hêsanî li zimanên din tê wergerandin. Bi zimanên wekî zimanê kurdî bikarhêner dikarin nivîsbariya azad serbixwe wergerînin û ne girêdayî şirketekê ne.

## Mînakên ji bo nivîsbariya azad

GNU/Linux - sîstema bikaranînê

Projeya GNU ji aliyê Richard Stallman hat dan dest pê kirin. Armanca vê projeyê çêkirina sîstemeke bikaranîna kompûteran a azad bû. Berdewamên sîstema GNU îro wek Linux tên bi kar anîn. Ji ber vê yekê şûna "Linux" jî "GNU/Lînux" tê gotin.

"Gnu" jî navê lawirekê ye, ji ber vê yekê wekî sembola GNU gelek car serê vê heywanê tê bi kar anîn.

Lîsansên GPL û Lîsansa Belgekirina Azada GNU (GNU FDL) ji bo projeya GNU hatin nivîsandin. Linux û Wikipedia îro projeyên herî mezin bin vê lîsansan in.


Mozilla

## Gerokên azad

**Mozilla**

Mozilla nivîsbariya ji bo înternetê ye. Mozilla nivîsbariya azad e û heta niha li kurdî nehatiye wergerandin. Li gor statîstikên sala 2005'an ên der barê gerokan (browser)de, li dinyayê textê ku di destê [Internet Explorer]] de ye bi tenê ji aliyê Mozilla ve tê hejandin û hejmara kesên ku wê bi kar tînin bi ser 50 milyon kesî ketiye.


Firefox

**Mozilla Firefox**

Mozilla Firefox an jî bi kurtasî Firefox gerokeke (browser) înternetê ye. Li gora gerokên din wekî Internet Explorer pir avantajên Firefoxê hene: Bi lêztir e û ewlekariya wê zêdetir e. Li hember reklam û vîrûsan pir baş diparêze.

Firefox nivîsbariya azad e û niha li kurdî tê wergerandin.


Ev wêneyê ga îro wekî sembola GNU tê naskirin. Ew jî ji nivîsbariya azad e. Nivîsbariya azad ji bo gelên pêşketî îro bûye çavkaniyeke girîng.


Sunbird

**Mozilla Thunderbird**

Bernameya e-peyaman

Mozilla Thunderbird (bi kurtasî: Thunderbird) bernameyek ji bo e-peyaman (e-mail) e. Hêj li kurdî nehatiye weşan lê di sala 2006'an de ew jî dê ji aliyê navenda komputergeriya kurdî Karger ve bête wergerandin.

Niha gelek bername hene ku mirov dikare bi riya wan bernameyan e-peyamên xwe bişîne û e-peyamên ji mirov re hatine jî bixwîne. Hin ji wan tên kirîn, hin jî belaş in. Taybetiya Thunderbird ew e, ku çavkaniya wê azad e, serbest e û ji herkesî re vekirî ye. Yanî heke te nivîsbarî û bernamenûsî xwendibe, tu dikarî vê bernameyê çêtir bi pêş de bixî.

**Wekî din:**

PHP-Nuke - programa sazkirina malperan

MySQL - database

MediaWiki - nivîsbariya ji bo Wikipedia

GIMP - programa wêneyê

OpenOffice.org - programên ofîsê

KDE û Gnome - programên sermasê (desktop environments)

Apache - programa pêşkêşkeran


FileZilla - bernameya FTP

WinSCP - bernameya SFTP

Gaim - bernameya suhbetê.

Abiword - bernameya nivîsandinê.

Sîstema Microsoft Windows bi xwe ne azad e, lê ji bo Microsoft Windows jî gelek nivîsbariyên azad hene.Azadiya nivîsbariya azad bi lîsansan weki Lîsansa giştiya GNU tê parastin.



Xwendevanên nivîsbarî û bernamenûsiyê!
Werin em bi hev re rojeke nû ava bikin.
Komeleya Lêkolîn û Pêşxistina Çand û Ziman | Karger www.karger.com.tr